Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1134 | 14-Çile- 2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | 423165

Kilaşên ji destên jinên Hewramanê

Jinên Hewramanê ku bi hemû hêza xwe çanda xwe ya dîrokî ya Zagrosê diparêzin, niha jî bi karê çêkirina kilaşan heman helwesta xwe ya hunerî nîşan didin.

Çêkirina kilaşan pîşeyekî dîrokî yê Hewramanê ye û demeke dirêj e ku Hewramî pê tên nasîn. Raza çêkirina kilaşên Hewramî çûye nav gelek efsane û kitêb û fîlman. Ji bilî aliyê wê yê madî, aliyekî wê yê estetîkî û hunerî jî heye. Wextekê karê mêran bûye, lê niha jinan jî bi hevkariya li gel hevjînên xwe dest dane vî karî û selîqe û nexşên wan ên jinanê di vî pîşeyî de xuya dikin. Jinan ciwanî û aliyekî din ê hunerî daye vî pîşeyî. Jineke Hewramana rojhilatê Kurdistanê ya jêhatî ku ji gundê Dizliyê ye û bîst sal in ku kilaşan çêdike.

Zemane Rehîmiyê di destpêka axaftina xwe de behs kir ku çawa ev kar nas kiriye û got: "Destpêkê min bi kilaşên zarokan dest pê kir û paşê ez hînî 'dewrçinîn' û 'sakar' bûm û niha ez kilaşkareke baş im û kilaşên mezinan jî çêdikim."

Li ser pêvajoya çêkirina kilaşan, Zemane Rehimiyê wiha got: "Kilaş ewil qumaş e, tînin û bi rengên şîn û sor reng dikin û paşê qumaş dibirin. Gava ku digihêje destên me jinan, sê qonaxên wê yên girîng dimînin. Qonaxa"dewrçinîn"ê jinek dike, qonaxa "sakarçinîn"ê jineke din dike û qonaxa dawîn ku "damger" e, jineke din dike.

'Kilaş soleke xwemalî ya resen e û pir baş li cil û bergên kurdî tê'

Jina jêhatî û şareza Zemane Rehîmiyê îşaret bi paqijbûna karê kilaşkariyê kir û got: "Demek e ku jinan li gel hevjînên xwe dest dane vî karî. Ji kilaşkariyê dahateke baş ji bo jinan heye. Ez ku nêzîkî bîst salan e kilaşkar im, min gelek sûd jê dîtiye û alîkariya xwe û mal û zarokên xwe dikim û min gelek astengiyên jiyana xwe pê çareser kirine. Ji hêla çandî ve jî kilaş soleke xwemalî ya resen e û pir baş li cil û bergên Kurdî yên wekî 'rankûçoxe', 'kewawpantol' tê. Bêhn jê nayê, çep û rasta wê tune ye."

Der heqê zêdebûna karê kilaşan de, Zemane Rehîmiyê ev tişt anîn ziman: "Niha ji ber zêdebûna rûniştiyan kar zêde bûye, kilaş bo gelek cihan tên şandin. Vê zêdebûnê jî hinekî bandor li dahata karê me kiriye."

'Kilaşkarî bûye pîşeyê nîvê jinên merîwanê'

Zemane Rehîmiyê diyar kir ku wextekê sed şagirtên wê hebûne û 200-330 cot kilaş dane çêkirin. Zemane Rehîmiyê bal kişande ser zêdebûna karê kilaşkariyê di nav jinan de û got: "Nîvê jinên Merîwanê kilaşan çêdikin. Malbatên wisa hene ku jin û mêr vî karî dikin û debara xwe bi vî karî dikin. Navdariya kilaşên Hewramî bi awayekî li Kurdistan û Iraq û Ewropayê jî belav bûye û ji van deran daxwaza kilaşên Hewramî tê kirin. Eger kar karê te be, baştir e û dahata wê zêdetir e."

Zemane Rehîmiyê bi vî rengî dawî li gotinên xwe anî: "Niha para dahatê ya zêde ji bo bazirganan diçe, kêmtir bo kilaşkaran diçe. Ji bilî vê yekê hin pirsgirêkên kilaşkariyê jî hene. Bo nimûne zenûnbûna çav, stûêşîn, milêşîn û serêşîn."

Bi çêkirina cil û bergan xwedî li çanda Kurdî derdikevin

Şadan Farûq û Şaniya Farûq ên xwişkên hev in dixwazin çanda cil û bergên Kurdî biparêzin.

Şadan Farûq a xelkê bajarokê Tewêle ye û niha li bajarê Silêmaniyê dijî, li gel xwişka xwe Şanaz Farûq û dû jinên din ev nêzî 7 meh e malperek a cil û bergên Kurdî bi navê 'Kuzhaka Kurdî' vekirine, bi çêkirin û firotina cil û bergên çandî parastina çandê dikin.

Şanya Farûq derbarê karê xwe de wiha got: "Me ev kar ji bo hêlana çanda Kurdî hilbijartiye, ji ber ji bo hemû cih cil û bergên Kurdî li ber xwe dikin. Me destpêkê di nava Kurdistanê de cil û bergên kurdî dikirî û difirot. Lê belê niha em ji welatên derve jî cil û bergên kurdî hawirde dikin. Niha di her çar werzê salê de cilên Kurdî li tên li ber kirin û giringî didine. Ev cihê keyfxweşiyê ye, ji ber di çend salên bûrî de cilên Kurdî ber bi tûnebûnê ve diçû."

Vanas Serwer a 15 salî yek ji keça Şadane dema ku dibîne dayîka wê bi cil û bergên Kurdî ve mijul dibe û dikeve nava kar û dixwaze weke dayîka xwe cil û bergên Kurdî li ber xwe bike. Vanas Serwer dibêje: "Ez gelek keyfxweşim divê temenî de cilên Kurdî li ber bikin ku nîşana netewiye."

'Divê malbat piştgiriya jinan bikin'

Şaniya Farûq got: "Peyama min ji bo jinan ewe ku, ez bi xwe weke jinekê piştgiriya jinên din dikim, daku bikarin her karê bikin û bi serbixin. Hemû kar di destpêkê de girane, lê belê encamên wê xweştire, her jinek armancek wê heye divê li ser armanca xwe berdewam bikin û bikarin bibin xwedî aboriya xwe ya serbixwe. Bila hewl bidin cilên Kurdî weke nîşana Kurdî bi parêzin û jin kêrhatiya xwe derbixin holê û malbat jî piştgirî bikin. Ji ber piştgiriya malbatê pêngavek giringe ji bo serkeftina jinê."

Sudoku: Bersiv 45

7	4	2	3	9	6	1	8	5
3	1	6	8	7	5	9	4	2
5	9	8	4	1	2	3	7	6
1	8	7	2	3	9	6	5	4
4	5	3	7	6	1	2	9	8
2	6	9	5	4	8	7	3	1
9	2	5	6	8	3	4	1	7
6	7	1	9	5	4	8	2	3
8	3	4	1	2	7	5	6	9

Sudoku:Pirs 46

9			7			1		
			1	4		2	9	7
2			8		5	4		
			6					9
		8		2		7		
4					1			
		6	9		4			2
3	4	9		6	8			
		2			3			4

FERHENGA BIWÊJAN

Kîso ji kendal ketibû nava avê jê we ye qey melevan e:
- Dema yek ne bi bawerî û xwesteka xwe dikeve nava kerekî, lê pesnê xwe bi karê xwe dide hingê jê re tê gotin.

Lawê Mencê çû qezencê:
- Baweriya min bi te nayê; heta niha te tiştên wisa nekirine.

Lingê wî di zikê wî de ye:
- Bawerî pê nayê; weke mar e.

Li ser wî guhî raze:
- Ez bawer nakim; tu xwe dixapînî. Li ber viran e:
- Li firsetan digere; ne durist e.

Mala minê:
- Baweriya min nayê.

Me ti baran ji wî ewrî nedîtiye:
- Heta niha me ti qencî jê nedîtiye; baweriya me pê nayê.

Mêrik ket bin siya axê, axa ket bin siya doxîna xwe:
- Xwe spart yekî bêbawerî; xwe avêt bextê yekî beredayî.

Mirov şîrê xav xwariye:
- Kengê çi bike ne diyar e; bawerî ji sedî sed bi mirovan nayê.

Mirov nikare li ber bayê wî biçe:
- Kengê çi bike ne diyar e; bawerî pê nayê.

Mirov nikare li gorî bayê wî biçe:
- Bi heman wateyê.

Mirov nikare bi cerê wî biçe avê:
-Bawerî pê nayê; mirov nikare pişta xwe bidiyê.

Ne yê piştgirêdanê ye:
- Ne yê roja tengiyê ye; ne yê baweriyê ye.

Ne pêş wî ne paş wî:
- Ne yê baweriyê ye.

Ne ol e ne îman e; îro Êzîdî ye sibe Misilman e:
- Ne yê baweriyê ye; her roj bi rengekî ye.

Nêrûmê dilîze:
- Ne yê baweriyê ye; durû ye.

Nokek di binê zimanê wî de şil nabe:
-Nizane tiştan veşêre; ne yê baweriyê ye.

Pişta xwe jê re vala neke:
- Bila baweriya te pê neyê; ne durist e; derfetê bibîne wê zererê bide te.

Pişta wî li kayê ye:
- Kesê xwe spartiyê bi kêrî tiştekî nayê, ne yê baweriyê ye.

Pişta wî li dîwarê derizî ye:
- Bi heman wateyê.

Pirêzeya wî nebaş e:
- Ne yê baweriyê ye; heta niha tişteke baş nekiriye.

Pirêzeya wî ne paqij e:
- Bi heman wateyê.

Pîrê nemire bihar hat:
- Ez bawer nakim ev kar pêk were; ev gotin tên wateya nabe.

Qibleya wî nîne:
-Bawerî pê nayê; her roj tiştekî diparêze.

Qirşê xwe nadim ser bendê wî:
- Ne yê baweriyê ye.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

'Hevpeymana Civakî nirx, maf û pirensîbên gelên Sûriyê diparêze'

Serokê Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanê Telal Mihemed destnîşan kir ku derxistina Hevpeymana Civakî di vê dema hestyar de bidestxistina gaveke dîrokî bû. Herwiha Mihemed anî ser ziman ku li gor madeyên Hevpeymana Civakî, herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyaya Demokrat e.**R-4**

Kongra Star bû vîn û hebûna jinan

Di 19'emîn salvegera damezrandina Kongra Star de endama Kordînasiyona Kongra Star Remziya Mihemed diyar kir ku bi ilhama felsefeya Rêber Apo jin gihiştiye asta ku îro pêşengiya cîhanê dike.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1134 | 14-Çile- 2024 | www.ronahi.net/ku/

XEBAT DÊRIK; FERMANDARÊ EFSANEWÎ Û PÊŞENGÊ ŞOREŞA ROJAVA

Xebat Dêrikê Fermandarê efsanewî û pêşengê şoreşa Rojava bû, bi kesayeta xwe ya ku bi wêrekî, hevaltiya xwe ya bê sînor û pêşengtiya di hemû warê jiyanê de dihate naskirin. Yek ji pêşeng û cangoriyên ku bingehê şoreşa Rojava ava kir. Xebat Dêrikê ku di 7'ê Çileya 2012'an de bi guleya îxanetê hat hedefgirtin, di 14'ê çileyê de şehîd bû û bû sembola şoreşa Rojava.**R-6**

Saleke tijî şer û berxwedanî

Endama hemahengiya Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Cîhan Hisên diyar kir ku tevî sala 2023`an salake giran û bêş bû lê di heman demê de saleke serkeftî û têjî berxwedan bû û got, em hêvî dikin ku di sala 2024`an azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk were.**R-5**

Çalakiya Dîlên Azadiyê di roja 49'an de didome

Çalakiya Girava Birçîbûnê ya Dorveger ku di 27'ê Mijdarê de, bi armnca tevlîbûna pêngava cîhanî ya azadiya Rêber Abdullah Oaclan li girtîgehên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê hatibû destpêkirin di roja xwe ya 49'an de berdewam e.**R-3**

' 5'emîn Festîvala Mîtan bi hêviya vegera Efrînê hat destpêkirin '

Festîvala Mîtan dengê berxwedanê li hember dijmin bilind kiriye. 5'emîn Festîvala Mîtan di roja xwe ya yekemîn de îradeya gelê berxwedêr ji tavahî cîhanê re raber kir û li ser dika şanoyê êş, hezkirin, berxwedanî, zihniyeta desthilatdaran û hêza baweriyê îfade kir.**R-7**

Li Efrîna dagirkirî revandina jinan sûcê şer e! — Zozan Cizîrî — R-2
Du gunehkar; Receb û Netanyahu — Ahmed Aktaş — R-4
Çareserî bi ramanên Rêber Apo re pêkan dibe — Idrîs Henan — R-5

Kongra Star bû vîn û hebûna jinan

Salvegera 19’emîn a Kongra Star ku di 15’ê Çileya 2005’an de li Rojavayê kurdistanê hate damezirandin û tê de gelek xebatên demdirêj hatin meşandin, bi armanca hişyarkirin û xwebirêxistina jinan di hemû qadên civakê de. Remziya Mihemed endama qordînasiyona Kongra Star diyar kir ku;” Bi ilhama felsefeya Rêber Apo jin gihiştiye asta ku îro pêşengiya cîhanê dike”.

Deriya Çiya/ Qamişlo

Tevgera jinan di destpêkê de li Rojavayê Kurdistanê, bi navê yekîtiya Star xwe bi rêxistin kir. Paşê di 15’ê Çileya 2016’an de Kongira Star xwe wek tevgera jin a Rojava îlan kir. Rêxistina jinan Kongira Star ji dema hatiya avakirin û heya niha ji bo bilindkirina jinan di her warî de asta têkoşînê bilind kir, jinên Kongira Star di jiyana siyasî û diblomasî de xwe bi rêxistin kirine û dixebitin. Derbarê salvegera Kongira Star a 19’emîn de endama qordînasiyona Kongira Satr Remziya Mihemed bi awayekî berfireh ji ronameya me re axivî.

Remziya Mihemed bal kişand ser rewşa jinê bi damezrandina Rêveberiya Xweser re û got; Rêveberiya Xweser a ku di sala 2014’an de hat damezrandin, bi awayekî mezin rê li pêşiya tevahî jinan vekir ku di nav civakê de hebûna xwe bide diyarkirin. Ew cara yekemîne ku di sîstemekî wekî sîstema Rêveberiya Xweser de jin di saziyên fermî de cihê xwe digirin. Di pirojeya Netewa Demukratîk de serokê desteyan wekî desteya jin û hemû desteyên din bi şêwazê hevserokatiyê tê birêvebirin. Lê di sistema dewletê de û di rêveberiyê de tenê mêr cihê xwe digre. Herwiha di milê cîgerên desteyan de jî ku jin tê de rolekî mezin dilîze û cihê xwe di nav de digire. Bingeha avakirina sîstema hevserokatî di vî warî de wekî Kongira Star xebatekî sereke ji damezrandina xwe hayanî îro da meşandin. Di heman demê de pêwîste jin wekî bîrdoziya rizgariya jin, xwe ji hemû tûndî û êşên ku li ser tê meşandin xelas bike. Pêwîste ku ew xwe bi rê ve bibe, karibe cihê biriyarê be, rolekî xwe yê mezin ji bo rêvebirina sîstema vî welatî bilîze. Di rêvebirina sîstema Rêveberiya Xweser de çawa ku em mafê xwe dixwazin erkê ku dikeve ser milê me jî pêwîste wek jin em pê rabin, di vî warî de di avakirina sîstema hevserokatî di sala 2016’an de wekî kongira Star rolekî wê yê mezin tê de hebû. Di sala 2016’an û şûn de hemû sîstemên meclis, komîn û akadimî xwe li ser van lingan birêxistin kirin. Ji ber vê yekê jî guhertinek di nav sîstemê de wekî meclisên Kongira Star li ser asta kantonan hatin avakirin û hem jî qomîteyên Kongira Star xwe di nav civakê de birêxistin kirin û navê wê ji Yekîtiya Star bû Kongira Star.

Bi felsefeya Rêber Apo jin di hemû warên jiyanê de pêşket

Rmziya Mihemed wiha berdewamî da axaftinên xwe û got; Di salên şoreşê de gelek guhertinên bilez hatin çêkirin ku xebatên me yên Kongira Star, li ser esasê ku meclis, kanton û civaka xwe birêxistin bikin. Herwiha qomîteyên di asta gişt de hatin avakirin. Li gor pêwîstiyê her du salan kongire tê lidarxistin û eger ku pêwîstî bi qomîteyekî hebe ew qomîte bi erêkirina hemû endamên kongirê li kongirê tê zêdekirin. Ji milê rêxistinbûna jin di salên şoreşê de ku gelek partiyên siyasî bi şoreşê re xwe bi rêxistin kirin û sîstemekî xwe dan avakirin. Ji ber ku di nava partiyên siyasî de bi taybet li Rojava eger partiyên kurdî yan bi gişt partî wek partiya Bass, her tim mêr bi rêve dibe. Lê di şoreşa Rojava de ku bi pêşengtiya jin şoreşa xwe destpêkir û destkeftiyên mezin bi dest xistine, bû mînak wekî partiya PYD’ê sîstema hevserokatiyê di nava xwe de birêxistin kir. Di nava partiyên siyasî yên din de jî êdî sîstema jin tê de hat avakirin. Di sala 2017’an de dema ku meclisên jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hat avakirin, li ser esasê piştgiriya Kongira Star ku xebatekî berfierh di aliyê têkilî û danûstandin bi rêxistinên jin ên heyê re hatin xurtkirin. Herwiha di xebatên jinên Suriyan, ereb li herêmên rizgarkirî êdî wan jî bi navê jinên zenûbiya xwe birêxistin kirin û dest bi xebatê kirin. Ev hemû jî xwe ji tecrûbeya xebatên Kongira Star û ji ilhama Felsefeya Rêber Apo ku pirojeya Netewa Demuqrat ji me re pêşkêş kiriye digre. Di nav van xebat û pirojeyan de êdî her jinek dikare di nav sîstema rêvebiriya xweser û herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyayê de xwe bi rêxistin bike.

Kar û xebatên Kongra Star

Remziya Mihemed derbarê kar û xebatên Kongira Star de weha got;” Em dikarin bêjin ku xebatên me yê Kongira Star sal bi sal pêşketinekî mezin di nav xwe de avakirine, êdî em dikarin xew bighînin qadekî berfireh ji jinan re ku hejmarek mezin ji jinan birêxistin bikin. Di heman demê de me karî bû di aliyê aborî, tendurestî, perwerdehî sîstema xwe wekî meclis ava bikin. Herweha wekî kongira Star me karî di asta cîhanî de jî xwe birêxistin bikin. Bi sedema koçberiya di van salên şoreşê de çêbûyî, ku malbatên me yên rojava derbasî gelek welatan bûne wek; Libnan, Başûr û welatên Ewropa ku pêwîste jinên me li van welatan xwe birêxistin bikin û li derdorê rêxistina xwe kom bibin û nekevin nav şerê taybet yên qepîtalîzmê de. Pêwîste têkoşînek ji bo vegera li welat bê meşandin, ji ber vê yekê jî nûnerên me yên Kongira Star li van welatan hene û xebatên me lê tê meşandin. Heta niha me karîbû du konfiransan li darxînin û xebatên xwe tê de binirxînin”.

Xebatên Kongra Star yên sereke

Remziya mihemed weha berdewamî da axaftinên xwe û got; Hîmên ku em xwe li ser ava dikin parestina ekolojî û rizgariya jin e, di vî warî de qomîteya me ya ekolojî li kêleke qomîteyên me yên din wekî tendurestî, aborî ku em parestina xwezaya herêmêm xwe ji tevahî şer û êrişên ku li ser herêmên me têne kirin û nexweşiyên ku derbasî herêmê dibin. Şerê taybet ê ku gelek bandora xwe li civakê dike. Ji ber vê yekê jî qomîtayek bi serê xwe di nav van xebatên me yê Kongira Star de hatiye avakirin. Yek ji qomîteyên ku di Kongira me ya 9’emîn de hatine damezrand, qomîteya azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ye, ku gelek xebatên me ji bo azadiya Rêbertî, tekoşîna me ji bo ku em Rêberê xwe azad di nava xwe de bibînin. Di vê qomîteyê de hem li darxistina semîner, komxebat, bilatforim, konfiransên ku êdî her kes tevlî van xebatan bibin. Herweha yek ji xebatên me yê sereke jî guhertin û veguhertina hişmendiya mêr e, ku li nav qomîteyên me yê sereke de me di kongira xwe ya 9’emîn de daye diyarkirin, ew jî hevjiyane azade ji ber ku di vê jiyanê de yek alî nayê jiyankirin. Bi taybet di van sîstem û xebatên me yên heyî de, pêwîstî bi hevbeşiya jiyanê û xebatê ji aliyê jin û mêr de heye. Me wekî Kongira Star erkek girtiye ser milê xwe ku pêwîste êdî em civaka xwe di aliyê zanist, naskirina jinolojî, hişmendî û dîroka jin de xurt bikin.

Pirojeyên Kongra Star yên dema pêş

Remziya Mihehemed endama qurdinasiyona Kongira Star, wiha pirojeyên xwe yên demên pêş diyarkirin û got; Lidarxistina civîna me ya salane biryar û bernameyên ku em di civînê de bigirin dest wê were pêkanîn. Bi giştî emê di asta perwerdê de xebateke berfirehtir bidin meşandin, ku her jinek cihê xwe di sîstema akademî û perwerdeyê de bibîne, di aliyê aboriya jin de pêşketinek bêhtir bidin meşandin. Herweha xebatekî konfiransê ji bo azadiya fîzîkî ji Rêber Apo re tê amedekirin, xebatên me yên bingeyîn ewe ku em van xebatan temam bikin. Di milê doblomasî de jî vekirinek di asta Rojhilata Navîn de, xebatekî berfireh ji bo wê tê emedekirin ku em van xebatên me yên heyî de, pêwîstî bi hevbeşiya jiyanê û xebatê ji aliyê jin û mêr de heye. Me wekî Kongira Star erkek girtiye ser milê xwe ku pêwîste êdî em civaka xwe di aliyê zanist, naskirina jinolojî, hişmendî û dîroka jin de xurt bikin.

Ramangeh

Li Efrîna dagirkirî revandina jinan sûcê şer e!

Zozan Cizîrî

Bi taybetî ji 18’ê Adara 2018’ê ve piştî Efrîn ji aliyê çeteyên dewleta Tirk ve hat dagirkirin, roj nîn e jin, zarok, ciwan, extiyar neyên revandin, neyên zîndanîkirin, neyin êşkencekirin û neyên qetilkirin. Di vê wateyê de şerekî cidî yê li dijî civakê mijara gotinê ye. Rêxistina Mafên Mirovan a Efrîn-Sûriyê roja 11’ê Çileyê ango duh jî nûçeyek belav kir ku, ev 10 roj in du xuşkên bi navê Henîfe û Zeynep Silêman Silêman ji gundê Goliya Jorîn a navçeya Raco ya Efrîna dagirkirî, ji aliyê çeteyên girêdayî dewleta Tirk ve hatine revandin. Li gor agahiyên vê Rêxistina Mafên Mirovan dayî, her du keç ji mala wan ber bi cihekî nediyar ve revandine û aqûbeta wan hîna jî nayê zanîn.
Di cihanê de ji ber sedemên cur bi cur şerên diqewimin, jin tim di pozîsyona duyemîn de wekî stratejiyeke şer, heta wekî çekekî şer tên bikaranîn. Wekî tê zanîn şîdeta li hemberî zarokên keç û jinan; bi rengê îstismar û destdirêjiyên cinsî, fizîkî û heştiyarî, di temenê biçûk de bi darê zorê zewicandin, her wisa bazirganiya însan û karkeriya seksê, kuştinên bi navê namûsê, sinetkirina jinan, di nav şer û pevçûnan de îstismara cinsî ya sîstematîk û hwd. tev dikevin nav çarçoveya şîdeta li ser jinan. Bi taybetî li Efrîna dagirkirî revandina her du xuşkan careke din eşkere kir ku, li herêmê şerekî bêkontrol, hilweşîner û şîdeteke tirsnak li ser jinan heye. Yanî dewleta Tirk hîn jî plana xwe ya qirkirinê û guhertina demografîyê ya li ser Efrînê didomîne.
Neteweyên Yekbûyî ku di mijara şerê navbera Rûsya-Ûkrayna de dem bi dem raporan diweşîne û di mijara îstismarkirina jin û zarokan de hişyariyan dide, mixabin di mijara kiryarên ne-mirovî û sûcên şer ên çeteyên dewleta Tirk li ser herêma Efrînê û giştî herêmên Bakur-Rojhilatê Sûriyê pêk tîne, xwe li ker û laliyê datîne. Wekî gelên vê herêmê di hemû çalakiyên xwe yên civakî de dibêjin, “bêdengî erêkirin e”; li vir hêja ye em careke din ji hemû saziyên mafên mirovan ên navnetewî yên cîhanê bipirsin, aya ji ber we ev qirkirin û şîdeta li ser jinan erê kiriye lewma hûn dengê xwe dernaxin? Eger çavên xwe li van sûcên şer ên li herêma me bi destê çeteyên dewleta Tirk tên pêkanîn digirin û tu helweşteke mirovî raber nakin, diyar dibe ku ew jî şirîkê van sûcên li dijî mirovahiyê ne.
Li herêmeke şer têde heyî gava jin tên revandin, di kesayeta jin-keçan de ya tê revandin esas rûmet û kerameta civakê ye. Bi gotineke rast, êrîşeke herî xedar û bêexlaq a li ser civakê ye. Di vê wateyê de revandina her du xuşkên bi navê Henîfe û Zeynep Silêman Silêman, sûcê şer ê li hemberî hemû jinan û gelê Kurd e. Îro taybet ji bo me Kurdan roj roja şeref û namûsê ye, roj roja xîret û kerametê ye. Li ser vê bingehê xwedîderketina li herdu xuşkan xwedîderketina li rûmet û kerameta xwe ye.

‘ 5’emîn Festîvala Mîtan bi hêviya vegera Efrînê hat destpêkirin ’

Festîvala Mîtan dengê berxwedanê li hember dijmin bilind kiriye. 5’emîn Festîvala Mîtan di roja xwe ya yekemîn de îradeya gelê berxwedêr ji tavahî cîhanê re raber kir û li ser dika şanoyê êş, hezkirin, berxwedanî, zihniyeta desthilatdaran û hêza baweriyê îfade kir.

Esma Mistefa/ Şehba

Festîvala Mîtan a 5’emîn bi dirûşmeya `Veger Nêz E, Bi Hêvî Ne` li herêma Şehbayê di dîroka 10 ê heyvê de hat destpêkirin. Ev festival weke yekemîn festîvala şanoyî li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê pênasekirin. Di nava xwe de mijar û şanogerên derveyî herêma Efrînê dihewêne. Di Mîtan 5 de mêvanên ji Başûrê Kurdistanê Kerkuk, Reqa, Hesekê û Kobanê beşdar bûne. Bi van mijar û pir rengbûna herêm û pêkhateyan Mîtan 5 tavahî sênorên dorpêçê dişkîne û careke din ji cîhanê re îradeya gelê xwedî doz nîşan dide. Di 11’ê mehê de weke roja yekemîn ya vekirina festîvalê bû û bi rengê şano û hunerî li hola çand û hunerê bi beşdarbûna bi sedan ji gelê herêmê Festîval hat berdan. Têkildarî Festîvala Mîtan 5 emîn Şanoger û yek ji komîteya amedekar ya Mîtan Zêneb Mihemed her wiha şanogerê ku rol di Mîtan 5 de girtiye Mîlad Yehye ji rojnameya me re axivîn.

`Mîtan zayîneke nû bû`

Zêneb destnîşan kir ku ew ji Efrînê de cihê xwe di Mîtan de digire û wiha pê de çû: “Di sala 2014 an de bi avakirina Rêveberiya Xweser re Mîtan yekemîn car li Efrînê hat amedekirin. Mîtan weke ji nû ve ji dayîkbûnê bi zimanê dayîkê şano çêkirin, huner avakirin û derketina li pêşberî gelê xwe hat dîtin. Ew gavên ku hatine avêtin bni hezkirineke mezin di welateki azad de hatin avêtin. Yekemîn car bêyî tirs em derdikevin ser dike û bi rengê xwe çanda xwe pêşkêşî cîhanê dikin. ji Mîtan 1 de ez cihê xwe weke şanoger tê de digirim, 3 festîvalên Mîtan li Efrînê hatin li

dar xistin. ew ji bo me weke şoreşeke çandî û şanogerî dihat dîtin. Her sal bi fikir, mijar û afrîneriyên zengîntir em derdiketin pêşberî gel. Lê mixabin dijmin bi êrîşên xwe Efrîn dagir kir”.

`Bi silogana em diçînin jiyanê em ê jiyanê geş bikin`

Zêneb anî ziman ku bi dagirkeriyê û koçberiyê re hestên nû hatin afirandin û Mîtan bû rengê berxwedanê dest pê kir û wiha got: “Piştî fermana ku li ser Efrînê hatiye rakirin, bê guman em bi jiyaneke zor û zehmet re rû bi rû man. Gotina koçberî bi sere xwe hemû êş û eleman dide îfade kirin. lê weke ku çawa gelê me bi îradeyeke mezin jiyan da avakirin. Festîvala Mîtan jî bi silogana xwe ya fermî `Em Diçînin Jiyan` jiyan ji nû de geş kir û bi Mîtan 4 û 5 derket. Bi vê gavê festîvala Mîtan bi hestên nû derketin pêş û bi rengê berxwedanê hat xemilandin. Li ser vî esasî Mîtan 5 emîn bi hêviya vegera Efrînê hat destpêkirin”.

Zeyneb Mihemed

Mîlad Yehya

`Armanca Mîtan di Şehbayê de hate cih`

Zêneb di axaftina xwe de diyar kir ku Mîtan 5 armanca ku di Efrînê de pêk neaniye di koçberî û dorpêçê de anî cih û wiha bi dawî kir: “Armanca ku Mîtan pê hatiye destpêkirin ew bû ku bibe festîvaleke navnetewî û Kurdistanî. Lê bajarê Efrînê ji ber qutbûna wê ji herêmên din re wekeografî di dorpêçê de bû. Niha li herêma Şehbayê Mîtan ew armanc û xeyalên xwe di rewşeke hê zehmetir de pêk anî, ew jî tevlîbûna giropên ji herêmên din e. ku em bikaribin armanca Mîtan ya ku huner, çand û rengê gelan di nava xwe de bihewîne pêk bînin. Bi rastî cudabûna Mîtan 5 ji festîvalên derbasbûyî gelkî cuda ye, me karî rûxmî dorpêçê jî Mîtan bibe festîvala yekemîn ya şano li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê”.

`Em ê destkeftiyên Mîtan biparêzin`

Her wiha şanogerê bi navê Mîlad ku yekemîn car e cihê xwe di Mîtan de digire anî ziman ku Mîtan ji bo wî pîroze û wê Mîtan bikin name û pêşkêşî cîhanê bikin û wiha got: “Ev bû 2 mehin ez cihê xwe di nava perwerdeya festîvalê de digirin, her wiha ev yekemîn car e ez beşdarî Mîtan dibim. Mîtan ji bo min tiştekî pîroz e û divê em wê biparêzin, cawa ku Mîtan gihîştiye vê astê em ê jî weke nifşên nû vê destkeftiyê biparêzin. Mîtan di nava xwe de gelek mijaran dihewîne û wan mijaran weke name pêşkêşî cîhanê dike. Bi vê hezkirinê û armancê emê riya Mîtan daye destpêkirin berdewam bikin”.

Wêjeya Şoreşê...(4)

Elî Roj

Ew gihiştina wê baweriyê ku tenê di warê leşkerî, siyasî û abûrî de ew nikarin bandora xwe li ser gel bidin meşandin, ji ber vê yekê dixwazin şerê bîrdozî, hişmendî û çandî li ser gel bimeşînin. Modernîteya kapîtalîst û dewleta netewî di riya bîrdoziya xwe ya lîberalîzmê dixwazin tevahî reng, teşe, çand û zimanên cûrbercûr di nava pergala xwe de bihelînin û tenê çand, ziman û bîrdoziya xwe li ser hemû civakan serwerbikin.
Ji bo ku vê di nava civakê de pêkbîne, êrîşî çanda gelan a resen dike û roj bi roj di çav û hişên mirovan de wê çandê piçûk û bê qîmet dike. Hemû derfet û îmkanên heyî ji bo pêkanîna vî tiştî xercdike, bi riya şerê taybet û derûnî, civakê dike mîna robotan û hestên civakê ziwa dike.
Di vî warî de mirov dikare bibêje wêje bê şoreş nabe û şoreş jî bi wêjeyê tê nasîn û armancên şoreşê bi wêjeyê dikarin mayend bibin û bibin malê civakê. Her netewek li gorî berhemên xwe yên wêjeyî dikare jiyaneke çawa armanc dike bide nasîn. Wêje îfada herî baş ya şoreşê ye. Şoreşek bi qasî ku xwe di milê edebiyatê de têr û tijî bike, wê gavê dibe malê civakê. Şoreş jî bi riya edebiyatê xwe ji gel û cîhanê tevahî re dide naskirin. Ji ber ku wêje erkê wê ew e ku şoreşê bi berhemên wê mayinde bike û hemû kêliyên berxwedan û tekoşîna ku şoreşê bi xwe re derxistiye holê li ser rûpelên dîrokê zindî bihêle.
Lewre şoreş xeyal û jiyaneke çawa hedef dike, wêje dikare bi awayekî sade birsiva vê yekê bide. Nivîskarekî Latîn Amerîkî, Ernesto Sabato dibêje “ Heger hûn nehêlin mirovek xeyal bike, ji xeyalên wî re astengiyan derxin, ew dê dîn bibe. wêje her tim dijber û li hemberî tiştan derketin e. wêje di serê her tiştî de çalakî ye. Berxwedana mirovan ya ji astengan û ji dînîtiyê xilas kirin e. Di rewşên giran de hunermend hatine qedexekirin, lê wêje hêza herî xurt dimîne.” Şoreş û wêje dihêlin ew xewnên ku têne behskirin bêne pêkanîn û civakeke etîk û estetîk pêkan be. Bi wêjeyê mirov dikare her rastiyên hatine jiyîn bi awayekî sade bîne ser zimên. wêje dihêle ziman jî pêşbikeve û çanda civakê ji kokê ve bê parastin.
Berevajî vê yekê armanca modernîteya kapîtalîst û dewlet netewan ewe ku serdestiya xwe li ser fikir, hizir û hişmendiya mirovan bidine meşandin û civakeke bê vîn û bê paşeroj û pêşeroj avabikin. Ji milekî din ve jî derûniya civakê serobino dikin û hemû cûreyên şeran li ser civakê didine meşandin û di cewherê xwe de dixwazin civakê tevahî di nava pergala xwe de bihelînin û bi riya vê yekê hest, xeyal û hizrên azad dîl bigrin. Bêguman dema ku wêjeya şoreşê bi hest, xeyal û asoyên tijî û dagirtî xwe bilêvbike, wê gavê şoreş wê tim di hiş, bîr û dîroka gelan de zindî bimîne. Bi qasî ku şoreş gava herî sereke ye ji bo avakirin û azadiya civakê, di heman demê de wêjeya şoreşê jî rastiya şoreşa heyî temam dike û agirê şoreşê hîn bêtir geş dike û di nava civakê de vîn û hestekî azad dide avakirin. Li gorî vê yekê çawe ku di qada şer û cengê de qehremanên şer û lehengên ku di çeperên şer de muhra xwe li dîrokê didin hene û hertim cihekî wan di hiş, bîr û dilên gelan de dimîne. Bêguman wêjevanî û wêjeya şoreşê jî mîna wî lehengê şer û cengê bi pênûsa xwe heman erkê digre ser milên xwe û rastiya şoreşê kêlî bi kêlî û gav bi gav li ser bîra mirovahiyê û dîrokê xêz dike û şûna xwe dihêle.

Fermandarê efsanewî û pêşengê şoreşa Rojava: Şehîd Xebat Dêrik

Xebat Dêrik Fermandarê efsanewî û pêşengê şoreşa Rojava û kesayeta ku bi wêrekî, hevaltiya xwe ya bê sînor û pêşengtiya di hemû warê jiyanê de dihate naskirin. Yek ji pêşeng û cangoriyên ku bingehê şoreşa Rojava ava kir. Xebat Dêrikê ku di 7'ê Çileya 2012'an de bi guleya îxanetê hat hedefgirtin û di 14'ê çileyê de, şehîd bû û bû sembola şoreşa Rojava.

Ronahî Sadûn /Qamişlo

Ji destpêka mirovahiyê ve heta roja me ya îro, di avakirina her welatekî ango destpêkirina şoreşekê de, kesayetên xwedî cesaret, zane û xwedî taybetmendiyên pêşeng derketin holê. Herwiha bi çirûska şoreşa Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê re, mirovin xwedî heman taybetmendiyan derketin ser dika dîrokê û çarenûsa gelê xwe guhertin. Yek ji wan pêşengê Şoreşa Rojava Şehîd Xebat Dêrik ê. Herwiha di şoreşa Rojava de, bi xeta berxwedanê ya demdirêj re, henek kesên ku ji mirovahiyê, sinc û welatparêziyê tu para xwe negirte, îxaneta malbata Ebdulah Bediro yê alîgirê ENKS'ê bû.

Şehîd Xebat Dêrik xwedî taybetmendiyên têkoşerê şoreşgerî bû

Malbata Ebdulah Bediro yek ji stûnê Şoreşa Rojava û damezrînerê YPG'ê, Xebat Dêrik hedef girtin. Şehîd Xebat Dêrikê di 7'ê Çileya 2012'yan de bi guleya îxanetê hat hedefgirtin û rakirin nexweşxaneyeke bajarê Helebê. Lê tevî hemû hewldanan jî, di 14'ê Çileyê de, şehîd bû. Şehîd Xebat Dêrikê xwedî taybetmendiyên têkoşer û şoreşgeriyê bû. Şehîd Xebat Dêrikê têkoşer, berxwedêr û pêşengekî ku di oxira azadî û serkeftina gelê xwe de, canê xwe fedakir. Xebat Dêrikê di sala 1962'yan de li gundê Kasan ê girêdayî bajarê Dêrikê di nava malbateke welatparêz de hate dinya yê. Ji ber rewşa zehmet a malbatê, xwendina xwe ya qonaxa seretayî bi dawî nekir. Piştre ji bo kar berî dide bajarê Dêrikê û ji zarokatiya xwe de bi çalakî û hezkirina ji xebatê re hat nasîn. Herwiha di temenê ciwantiya xwe de ji ber rewşa malbatê ya nebaş ya mîna hemû malbatên Kurd ji ber siyaseta ku rejîma bas li ser gel dida meşandin şehîd Xebat ji ber ku nedikarî debara xwe û malbata xwe bike û berê xwe da Şamê.

Pêdiviya welat bi îxanetê tuneye, bi welatparêziyê heye

Di heman demê de dema şehîd Xebat leşkertiya artêşa Sûriyê li Lubnanê kir, Tevgera Rizgariya Kurdistanê nas kir. Şehîd Xebat bi fikirê tevgera rizgariyê bandor dibe û tevlî tevgerê dibe. Şehîd Xebat di 1985'an de berê xwe dide Akademiya Mahsûm Korkmaz a herêma Bîqa ya Lubnanê. Di akademiyê de perwerdeya Rêber Abdulah Ocalan dibîne û di 1987'an de berê xwe dide çiyayên Kurdistanê. Şehîd Xebat li çiyayên Kurdistanê, dibe hevalê çiyayan û li çiyayan ne tenê gerîlayek bû, lê belê têkoşer û fermandarek bû, ku gerîla li dijî dijmin bi rê ve dibir. Xebat nas dikir ku welatparêzî ne tenê bi gotinê ye, lê bi xebat û têkoşînê ye û pêdiviya welat bi îxanet û tesmîlkaran tune ye, lê belê pêdivî bi têkoşer, gerîla û fermandaran heye. Şehîd Xebat bibû parçeyek ji xwezaya Kurdistanê ya bedew û mîna mamizan li ser çiyan digeriya û ji bona xwe tu astengî nasnedikirin û ji jiyan û hevalên xwe pir hezdikir.

Şehîd Xebat bi damezrandina YPG gavekî dîrokî avêt

Di têkoşîna xwe de, erka endametiya Meclisa Leşkerî ya HPG'ê û fermandarê Ayaleta Botanê wergirt, piştre dibe endamê Konseya Navendî ya KCK'ê. Şehîd Xebat Dêrik tevlî şoreşa azadî û parastina gelê Rojava bû. Ji destpêkê ve û her tim di eniyên pêş û cihên herî zor û zehmet de digirt û li hemberî zehmetiyan tucaran gav şûnde netavêt. Kar û xebat li ser bingehê perwerdekirina gel da meşandin û di wê yekê de xwe spart fikirê ku civaka exlaqî-polîtîk bide avakirin. Herwiha rola pêşeng di rêxistinkirina xwepêşandanên ciwan û gel de jî lîst. Şehîd Xebat, bi damezrandina YPG'ê de gaveke dîrokî avêt, Şehîd Xebat, berxwedêrekî mezin bû. Berxwedaniya şehîd Xebat bi coş, kelecan û fedakarî bû. Fermandar Xebat bi damezirandina Yekîneyên Parastina Gel (YPG) gaveke dîrokî avêt.

Şervanên Şehîd Xebat di çeperên pêş de pêşengin

Şehîd Xebat ku di sekina xwe ya fermandariyê de şêwazê fedayinê afirandibû, ev bû wesîleya pêşxistina şervantiya bi disîplîn li dijî her cûre paşverûtiya ku li Kurdistan û Rojhilata Navîn tê jiyan kirin. Şervanên Şehîd Xebat di çeperên pêş de, pêşengin, Eger şoreşek bi ser bikeve pêwîst e bingehên wê saxlem bin. Şehîd Xebat bingeheke saxlem avêt. Bi taybet gelê Kurd ku bi hezarên salan ji derveyî xwe ji her kesî re leşkerî dikir. Lê vê carê tenê ji bona xwe leşkerî dike, li ser bingeha parastina cewherî artêşek ji yekîneyan hat avakirin. Gelê herêmê ku ji Kurd, Ereb, Suryan û ji pêkhateyên cur bi cur pêk tê, anîn gel hev. Îro avabûyîna pergala demokratîk a gelan îspata wê ye. Şervanên Şehîd Xebat ku ji hemû pêkhateyan bûn di heman çeperan de mil bi mil li cem hev û di nava berxwedanê de cihê xwe digirtin. Şehîd Xebat Dêrik di demên herî zehmet de xwe kir mertal li hember dagirkeriyê û canê xwe feda kir.

Felaketên xwezayê yên wêranker

Ayşa Silêman/ Qamişlo

Ji destpêka sala 2023'an ve 4 felaketên xwezayî yên wêranker Li gorî çavdêriya "Pergala Hişyarî û Kordînasyona Afatê ya Cihanî" çêbûne. "Erdhejên Qehreman meriş û Hatayê, şewatên Tişêlî û bahoza Madaxeşqer.

Ev pergal çarçoveyek hevkariyê ye, di navbera Neteweyên Yekbûyî, Komîsyona Ewropî û rêvebirên ajansên karasetan li seranserî cîhanê û bi baştirkirina hişyarî, pevguhertina agahiyan û hemahengiyê di qonaxa yekem de piştî karesatên mezin yên ku ji nişka ve çêdibin mijûl e.

Rêjîmê erdhejên ku di 6'ê Sibatê de li Başûrê Tirkiyê û Bakurê Sûriyê qewimîn wek herî tund nirxand. Di navbera van karesatan de ji aliyê bandor û bermahiya wê ve. Ji destpêka sala 2023'an û vir ve 4 felaketên mezin hatine tomarkirin ku "Tehlûkeya giran" pêk tîne. Li ser gel, ew wekî wêranker tê tesnîf kirin û nîvê wê li Tirkiyê ketiye.

Karaseta yekem: Erdhejên Qehreman meriş "

Gelek erdhejên wêranker, ku navenda wê parêzgeha Qehreman meriş (başûr) bû, herwiha bû yek ji wan felaketên herî wêranker ên salên dawî û ya herî mezin di Ewropayê de.

Şopandina"Pergala Hişyarî û Kordînasyona Afata Gerdûnî" diya kir ku di 6'ê Sibatê de 3 erdhej li pey hev çêbûn; Erdheja yekem bi hêza 7.8 li devera Bazajîk bû û ya duyem jî li bajarê El-Bustan bû hêza wê 7.5 bû.Erdheja sêyem jî hêza wê 6.7 û navenda wê li Bakurê Rojavayê Herêma Tork oxlo bû. Li gorî Pergala Hişyarî û Kordînasyonê ya Gerdûnî erdhejên Bazacîk û El-Bustan wekî ku pir xeternak hatin binavkirin, erdheja Tork oxlo jî wekî erdheja xeter hate destnîşankirin. Li gorî daneyên Rêveberiya Rewşa Afat û Rewşa Lezgîn a Tirkiyeyê, (AFAD) li Tirkiyeyê ji bilî wêraniya madî ya mezin, bi riya vê karasetê sê caran zêdetirî 46 hezar kesî jiyana xwe ji dest dane. Her wiha li gorî Tora Sûriyê ya Mafên Mirovan, li Sûriyê erdheja ku pêk hatî, 2 hezar û 928 kesî jiyana xwe ji dest dan.

Karaseta duyem Şewatên Tişêlî

Nêzî 13 rojan şewatên mezin di daristanan de li Tişêlî berdewam kir û ew wek karasetên pir xeternak hat binavkirin. Sedema vê şewatê ji ber ku pêla germê dijwar bû, encama vê şewatê 25 kesan jiyana xwe ji dest dan û zêdeyî 3 hezar kes jî birîndar bûn. Di şewatê de 270,000 hektar xirab bû, ji bilî 1081 xanî, û bandor li jiyana herî kêm 7000 kesan jî kir.

Karaseta sêyem Erdheja Hatayî

Di 20'ê Sibatê de erdhejek bi mezinahiya 6.3 li parêzgeha Hatayî ya li Başûrê Tirkiyeyê çêbû û ev yek hat diyar kirin ku erdheja herî xeternake. Di vê erdhejê de avahiyên ku ji ber erdheja Qehreman Meriş zirar dîtibûn hilweşiyan û di encama erdhejê de 6 kesan kesî jiyana xwe ji dest dan û 562 kes jî birîndarbûn.

Karaseta çarem Lehiyên Berazîl

Di 19'ê sibatê de li Berazîl baran zêde barîbû û ev yek bû sedema şemitîna axê û gelek xanî hilweşiyan. Di encama lehî û hilweşandinê de 54 kesî jiyana xwe ji dest dan.

Bahoza Niyûzîlanda

Li Niyûzîlanda sedema bahoza Gabrîyêl di nav du hefteyan de 11 kesî jiyana xwe ji dest dan. Ev Bahoz wek bûyera hewayê ya herî wêranker hat binavkirin û bû sedema lehî, şimitîna axê û qutbûna elektrîkê. Her wiha ev yek bû sedema bêwarbûna zêdetir ji 9000 kesan û nêzîkî 3000 kes ji bo navendên berevaniya sivîl hatin veguhestin.

Lehiyên Madxeşqer

Di destpêka meha Sibatê de, Neteweyên Yekbûyî ragihandibû ku 58 kes li Madxeşqerê ji ber barana zêde û lehiyên beriya bahoza Batsêrayî jiyana xwe ji dest dane.

Çalakiya Dîlên Azadiyê di roja 49'an de didome

Çalakiya Girava Birçîbûnê ya Dorveger ku di 27'ê Mijdarê de, bi armnca tevlîbûna pêngava cîhanî ya azadiya Rêber Abdullah Oaclan li girtîgehên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê hatibû destpêkirin di roja xwe ya 49'an de berdewam e.

Navenda nûçeyan

Di çarçoveya piştgiriya pêngava azadiya Rêber Abdullah Ocalan, herwiha bi boneya salvegera damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê, li girtîgehên Tirkiye û Bakurê Kurdistanê di 27'ê Mijdarê de çalakiya greva birçîbûnê ya dorveger ku hatibû destpêkirin, di roja xwe ya 49'an de dewam dike. Li gorî agahiyan bi giştî li 104 girtîgehan girava birçîbûnê tê meşandin.

Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan 25 sal in li Girtîgeha Îmraliyê di tecrîdê de tê ragirtin û 32 meh in jî bi tu awayî destûr nayê dayîn ku bi malbat û parêzerên xwe re hevdîtinan bike. Bi daxwaza azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û çareseriya pirsgirêka Kurd di 10'ê Cotmeha 2023'an de pêngava cîhanî ay bi dirûşmeya 'Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî ' destpê kir. Ji çar aliyên cîhanê, akademîsyen, rojnamevan, rêxistinên civakî yên sivîl, partiyên siyasî, parlamenter, aktîvîstên têkoşerên maf, fîlozof, kesên hêjayî xelata aştiyê ya nobelê hatine dîtin, nûnerên rêxistinên jinan û kesayetên azadîxwaz tevlî kampaniyê bûn.

Sûcên dagirkeriyê yên li hemberî jinan gihştiye lûtkeyê

Navenda Nûçeyan/ Şehba

Sûcên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê yên derheqê gelê resen yên Efrînê û bi taybetî li dijî jinên kurd binpêkirina tevahiya zagon û pîvanên navneteweyî ye. Herî dawiyê dagirkeriyê biryara darvekirina du jinan jî ilan kirine û li hemberî wê rêxistinên navnetewî bê deng in.

Piştî dagirkirina bajarê Efrînê di 18'ê Adara 2018 an de ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê û komên çeteyan yên girêdayî wê. Kuştin, revandin, destdirêjî, talankirin û tecawîzkirina jinan bi hemû hovîtiya xwe hatin pêk anîn. Bê guman ev sûcên derheqê mirovahiyê de bê navber heyanî vê kêliyê jî tên domandin. bi taybet derheqê jinên Kurd de neheqî û destdirêjiyeke derveyî pêvanên mirovahiyê hatine pêk anîn. Di zîndanên dagirkeriya Tirkiyê yên bajarê Efrênê de bi sûcên cuda bi sedan jinên Kurd hene û çarenûsa wan ne diyar e. bi dehan jinên kurd di zîndanan de hatine qetil kirin. di vê çarçûveyê de her çendî tesbît kirin û belgekirina wan kiriyaran hatiye kirin û ji raya giştî re hatiye pêşkêş kirin. lê belê tu biryar û şopandineke navnetewî ji wan zîndanan re nehatiye kirin. herî dawî ji aliyê dadgeha faşîzma Tirkiyê û çeteyaan ve di derheqê 2 jinan de yek Kurd û yek Ereb de biryara darvekirinê hat belav kirin. her wiha 8 jinên Kurd bi biryara girtina bê dawî yên di zîndana Efrînê yê navendî de dimînin hatiye wergirtin. Têkildarî van sûc û biryarên ku hatine girtin endamên koordînasyona Kongra Star ya kantona Efrîn û Şehbayê Elîf Mihemed û Ferîde Îbo ji rojnameya me re axivîn.

`Hebûna gelê Kurd tê tune kirin`

Elîf di destpêkê de diyar kir ku dijmin di Efrînê bi dîrok û nirxên Kurdan dilîze û dixwaze hebûna Kurdan tune bike û wiha domand: "Ev derbasî sala 7 emîn dibe ku gelê Efrînê Koçber bûye û beşek ji gelê Efrînê di bin zora dagirkeriyê de jiyan dike. di nava van salên serweriya dagirkeriya Tirkiyê li ser Efrînê de tavahî binpêkirin û talankirina bi armanca qirkirina nasnameya gelê Kurd tê meşandin. her wiha kiryarên dagirkeriya Tirkiyê li ser gelên koçber di herêma Şehbayê de nehatin rawestandin. Ji 6 salan ve faşîzma Tirkiyê bi hovîtiya xwe dîroka gelê resen yên Kurd û nirxên herêmê dilîze da ku hebûna Kurdan bi temamî tune bike. weke herêmeke tirkan nîşan bide".

Elîf Mihemed

`Divê qêrîna jinên Kurd yên di zindanên dagirkeriyê de bigêje mirovahiyê`

Elîf da xuyakirin ku jinên Kurd di Efrînê de banga rizgarkirinê dikin û divê qêrîna wan bighêje mirovahiyê û wiha domand: "Jinên Kurd yên Efrînê ji roja dagirkirinê de rû bi rû bi destdirêjiya komên çeteyan û yên artêşa Tirk re dimînin. Di zîndanên Efrînê de bi sedan zarok û jinên Efrînê hene. Di bin navên cuda û ne diyar kirî de ev jin tên girtin û bê lêpirsîn tên dadgeh kirin. herî dawiyê weke ku hatiye ragihandin 10 jinên Kurd bi biryara girtina Muebed hatine girtin, her wiha li gorî rêxistina Mafê Mirovan da ye eşkerekirin di derheqê 2 jinan de ku yek ji wan ji pêkhateya Erebe biryara darvekirinê di zîndana navendî ya bajarê Efrînê de hatiye birîn. Her wiha bi van ceza û sûcan bi sedan jinên Kurd hene ku tavahî cîhan lal, ker û kur e. Li ser vê esasê em banga hemû rêxistinên jin û rêxistinên parastina mafê jin di cîhanê de dikin, her wiha em banga dadgehên navnetewî dikin ku derbasî herêma Efrînê bibin û sûcên faşîzma Tirkiyê û komên çeteyan belge û ceza bikin".

Ferîde Îbo

ku qêrîna azadiyê û rizgarkirinê dikin. divê dengê van jinan bigihîna mirovahiyê û lêpirsîneke cidî ji aliyê navnetewî de werê çêkirin".

`Erka rêxistinên navnetewî ye ku derbasî Efrênê bibin`

Her wiha Ferîde destnîşan kir ku her çiqas belgekirina van sûcan hatiye kirin lê raya giştî û rêxistinên mirovî bê deng man e û wiha pê de çû: "Dagirkeriya Tirkiyê dixwaze hebûna xwe di li wir rewa bike. ev jî bi destekdayîna hin aliyên din tê kirin, her wiha rêxistinên navnetewî ji bo berjewendiyên xwe çav li ser sûcên dewleta Tirk girtine. Tişta ku di Efrînê de her wiha di Girê Sipî û Serê Kaniyê de tê kirin, ji mijara dagirkirina xakekê wêdatir e. qirkirina gelekî û bi taybet mafê jinan tê talan kirin. ev yek pêvan û zagonên rêxistinên mafê jin yên cîhanî derbas dike. lê belê em dibînin ku qêrîna azadiyê û rizgarkirinê dikin. divê dengê van jinan bigihîna mirovahiyê û lêpirsîneke cidî ji aliyê navnetewî de werê çêkirin".

Kewser Hemede ji welatiyên Efrînê û Şemse Hemid yê 45 salî ji pêkhateya Ereb ku ji 5 salan ve hatine girtin cezaya darvekirinê li wan hatiye birîn.

Leyla Yousêf ji 5 salan ve hatiye girtin û cezaya 15 sal girtiye.

Emîne Bekir Sultan ji 2 salan ve girtiye û cezaya 10 salan girtiye.

Nura Sîdo ji 2 salan ve girtiye û cezaya 8 salan girtiye.

Fatme Xalêd Osman ji 4 sal û 6 mehan ve girtiye û cezaya 7 salan girtiye.

Îman Xalêd Kênco ji 3 salan ve hatiye girtin û bi 7 salan ceza bûye.

Xezalê Selmo ji 3 salan ve hatiye girtin û bi 7 salan ceza bûye.

Xalde Fozî ji 3 salan ve girtiye û bi 7 salan ceza bûye.

Mîra Sîdo ji 6 salan ve girtiye û heyanî niha nehatiye dadgeh kirin.

'Dewleta Tirk dixwaze bi êrişan pêşî li têkoşîna li dijî terorê bigre'

Navenda Nûçeyan

Rêveberiya Xweser diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker bi êrişên xwe yên li ser herêmê hewl dide xetereyên mezin li ser hewldanên têkoşîna li dijî terorê çêke. Rêveberiya Xweser li dijî êrişan banga xweparastinê kir.

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê têkildarî êrişên dawiyê yên dagirkeriya Tirk li ser herêmê, daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Daxuyanî wiha ye:

"Dewleta Tirk a dagirker siyasetên xwe yên sûc li dijî herêmên me didomîne, navendên xizmetguzariyê û binesaziya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dike armanc. Dewleta Tirk derengiya şevê herêmên Tirbespiyê, Rimêlan, Dêrik û Çîlaxa bombebaran kirin. Armanca van êrişan diyare ku ewlehiya herêmê xirab bike û xeteriyên rasteqîn li ser hewldanên têkoşîna li dijî terorê çêbike û rê li pêşiya çareseriyê bigire ku şert û mercên wê li herêmê peyda dibin.

Êriş berdewama xeta qirkirin, koçberkirina şêniyan û valakirina herêmên me ye. Ev siyaeteke qirêje, divê hişyarî li hemberî wê û xetereyên wê werin kirin. Em diyar dikin ku divê ev êrişên li ser herêmên me werin sekinandin. Her wiha em diyar dikin ku encamên êrişan li ser tevahî herêmê xetere ne û xizmeteke bê berdêl ji bo vegera terorê ye. Di heman demê de hewldanek ji bo pêşxistina nakokiyên etnîke ku Tirkiye heta vê kêliyê nekariye derxe. Tirkiye bi awayekî aşkere dixwaze sûdê ji bûyerên li herêmê rû didin bigire û dek û dolabên xwe li dijî gelê me pêk bîne. Her wiha dixwaze gelê Tirk bixapîne û berê wan ji têkçûna xwe bikişîne.

Em bang li tevahî hêzên çalak ên li Sûriyeyê dikin ku xetereya van êrişên ne rewa û encamên wê yên neyînî li ser hewldanên peydakirina îstiqrarê li herêmê nas bikin. Her wiha ev êriş, li ser xebatên birêxistinkirina civakî û peydakirina çareseriyeke demokratîk li herêmên me û hewldanên tunekirina terorê û fikrê tundraw gef in. Divê rêxistinên hiqûqî û mirovî bi erkên xwe rabin û berpirsyariyên xwe bînin cih ji bo ku rê li pêşiya van êrişan bigirin.

Em bi gelê xwe bawerin ku armancên êrişan û siyasetên dijminane yên li dijî herêmê nas bike. Em bang dikin ku xwedî li saziyên xwe, parastinê û xweparastinê derkevin. Ji bo parastin û serkeftina projeya Neteweya Demokratîk û biratiya gelan, jiyana hevbeş, erkên xwe bînin cih. Projeya gelê me, vîn û îsrara wê rêya ber bi serkeftinê ye û têkbirina tevahî projeyên qirkirinê ye."

‘Hevpeymana Civakî nirx, maf û pirensîbên gelên Sûriyê diparêze’

Serokê Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanê Telal Mihemed deŝtnîşan kir ku derxiŝtina Hevpeymana Civakî di vê dema heŝtyar de bideŝtxiŝtina gaveke dîrokî bû. Herwiha Mihemed anî ser ziman ku li gor madeyên Hevpeymana Civakî, herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyaya Demokrat e. Di heman demê de ev hevpeyman nirx û pirensîbên hemû gelên sûrî diparêze.

Hemza Sêvo/ Qamişlo

Rêvberiya Xweser a herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 12’ê Berfanbara sala bûrî de Hevpeymana Civakî derxist û pêşkêşî hemû gel, sazî, tevger û partiyên siyasî yên herêmê kir.

Di Hevpeymana Civakî de biryarên girêdayî warên civakî, siyasî, aborî, çandî, exlaqî, bîrwerî, perwerdeyî û hwd… in.

Herwiha ev hevpeyman ji 134 madeyên girîng û bingehîn pêk tên, her madeyek jî xwedî taybetmendiyeke bi nirx e. Ji van madeyan jî 3 made li ber destan in weke Madeya 15’an e, ya dest nîşan dike ku: “Nirxên jiyana hevbeş li gor prensîbên Neteweya Demokratîk in û ew jî li ser hîmê xuşk û biratiyê ne. Di çarçoveya vê prensîbê de li jêr sîstema civaka demokratîk, di navbera gel û komên li Bakur û Rojhilatê Sûrî hemûyan de civakeke azad û adil were xurtkirin. ”

Madeya 16’an jî diyar dike ku: “Rêveberîya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê mafên gelê Kurd ên siyasî, aborî, çandî misoger dike û xisletên wî yên dîrokî û xetên sereke yên demografîyê yên herêmên kurdî diparêze. ”

Li aliyekî din Madeya 5’an tekez dike ku: “Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, beşekî bingehîn ji Komara Sûriyê ya Demokratîk e. ”

Herwiha girêdayî madeya 5’an, 15’an û 16’an yên Hevpeymana Civakî, serokê Partiya Aşîtiya Demokrat a Kurdistanê Telal Mihemed ji rojnameya me re axivî.

‘Madeya 15’an nirx û pirensîbên gelan diparêze’

Telal Mihemed diyar kir ku madeya 15’an ji Hevpeymana Civakî, nirx, maf û perensîbên gelên sûrî diparêze û wiha got:“Em tev dizanin ku di 12’ê Berfanbara sala derbasbûyî de, erêkirin li ser Hevpeymana Civakî ji aliyê Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser ve hat kirin. Ev hevpeyman ji encam û tecrubeya damezrandina Rêverberiya Xweser e û piştî diyalog û danûstandineke dirêj bi civak, rêxistin û partiyên siyasî re hat derxistin. Rêveberiya Xweser jî nimûne û riya gelên sûrî ye. Piştî destpêkirina kirîza Sûriyê, şoreşa 19’ê Tîrmehê bû şoreşa gelên bindest û dûrî rêjîma Bais û hêzên Rikberiya Sûriyê xeta 3’emîn hilbijart. Herwiha piştî ked, şoreş, xebat û têkoşîneke mezin a gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Rêveberiya Xweser hate damezrandin. Beriya şoreşa 19’ê Tîrmehê, rêjîma Baisê siyasteta yeknetew yek al û yek ziman li Sûriyê ferz dikir û mafê pêkhateyên din binpê dikir. Pirsgirêka netewa kurd nimûneya herî nêz û berbiçav e. Bi destpêkirina şoreşa 19’ê Tîrmehê û avabûna Rêveberiya Xweser re, êdî pirrengiya gelan, jiyana hevbeş û mafê hemû gelan hate qebûlkirin. Hevpeymana Civakî jî ji vê yekê ne dûr e û madeya 15’an jî vê hevpeymanê nirx û pirensîbên gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevan diparêze. Tecrûbeya Hevpeymana Civakî ya li ser bingehê Netewa Demokratîk e, ji bo çareserkiria kirîza Sûriyê û pirsgirêkên gelan pirojeya siberoja Sûriyeke demokrat û aştiyane ye. ”

‘Li gor madeya 16’an doz û mafê gelê kurd rewa ye’

Mihemed anî ser ziman ku li gor madeya 16’an a Hevpeymana Civakî maf û doza kurdên Rojava rewa ye û wiha domand: “ Nêzî 30 ji 100’î ji erdîngariya Sûriyê girêdayî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Bi piranî bajar, gund û navçeyên kurdî di erdîngariyê de tên dîtin û şêneyên van bajar, gund û navçeyan kurdên resen yên herêmê ne. Kurdên wê herêmê jî di warê mafê aborî, siyasî, civakî, perwerdeyî û hwd... de mîna netewên din distîne. Li aliyê din, hin deverên kurdî yên ku ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve hatine dagirkirin pirsgirêkeke bingegîn e ji bo kurdên Rojava û pêwîste werin rizgarkirin. Di dema pêş de ger ku kirîza Sûriyê bi awayekî demokratîk çareser bibe,wê dagirkeriya Tirk neçar bimîne ku xwe ji deverên dagirkirî weke Efrîn, Serêkaniyê û Girê Sipî vekşîne.

Rêveberiya Xweser bi madeya 16’an a Hevpeyîmana Civakî tekez dike ku doz û mafê gelê kurd di hemû waran de rewa ye. ”

‘Rêveberiya Xweser parçeyeke ji Sûriya demokratîk’

Serokê Partiya Aşîtiya Demokrat a Kurdistanê Telal Mihemed destnîşan kir ku madeya 5’an a Hevpeymana Civakî teke dike ku herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, beşeke ji Komara Sûriyaya Demokratîk û wiha axivî:“Hevpeymana Civakî bi hemû madeyên xwe ve li ser bingeha Netewa Demokratîk a ku hîmê wê li ser felsefeya Rêber Apo ye. Di vê dema hestiyar de Hevpeymana Civakî gaveke dîrokî ye. Ev hevpeyman ji encama kar û xebata Rêveberiya Xweser ji sala 2014’an ve ye û hêzên navdewletî û hevalbendên Rêveriya Xweser bi nerîneke erênî li piroje û hevpeymana Civakî dinêrin. Hevpeymana Civkî ji bo çareserkirina pirsgirêka gelê kurd û gelên din weke pirojeya herî guncav e. Herwiha jiyana hevbeş û pirrengiya ziman û neteweyên tevahiya Sûriyê hîmê Sûriyaya demokratîk e. Lewma Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di madya 5’an de tekez dike ku herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşek ji Komara Sûriyaya demokrat e. Di heman demê de şêwe û hişmendiya ku rêjîma Baisê di hundirê civakê de daye çandin red dike. Herwiha ji bo ku ev hevpeyman bikeve warê piratîkî de pêwîste hemû partî û hêzên siyas, rêxistinên civakî û hwd... li gor wê tev bigerin û pêk bînin. ”

‘Vîna gelê berxwedêr ji top û planên dijmin bihêztir e’

Zana Roj/ Şehba

Dewleta Tirk a dagirker siyaseta qirkirina gelê kurd bi tevahiya şîwazan û bênavber dewam dike. Şêniyên Efrînê yên ku li navçeya Til Rifetê jiyan dikin tekez kirin ku berxwedaniya gel ji top û balafirê dagirkeriya Tirk xurtir e.

Herêma Şehbayê ku rojane di bin êrîşên dagirkriyê re derbas dibe, li hember van hedefgirtin û êrîşan bêdengiyeke cîhanî heye. Rûxmî ku herêma Şehbayê piraniya wê koçberên Efrînê ku di encama şerê dagirkeriya Tirkiyê de lê bi cih bûne. Lê ji 6 salan ve hovîtiya faşîzma tirkiyê û komên çete yên girêdayî wê lê ser herêmê nehatiye rawestandin. Dagirkeriya Tirkiyê ne tenê Rêveberiya Xweser hedef digire di hemû êrîşan de sivîlan armanc dike.

Têkildarî êrîşên li ser herêmê şêniyên Efrênê yê li navçeya Til Rifet dimînin Zêneb Silêman û Recae Hisên ji rojnameya me re axivîn.

`Rojane gelê herêmê tê hedefgirtin`

Zêneb di destpêkê de diyar kir ku navçeya Til Rifet rojane bi obîs û topbarana tê hedefgirtin û wiha got: “Ji 6 salan ve dagirkeriya Tirkiyê êrîşê tavahî herêmên Şehbayê dike. bi taybet navçeya Til Rifet û gundewarên Şêrawa bi awayekî hovane bi opîs û topbaranan tê hedefgirtin. Rûxmî ku herêm de koçberên Efrînê û hemwelatiyên Şehbayê lê jiyan dikin, lê dîsa jî rojane ev gel tê armanckirin”.

`Pilana dewleta Tirkiyê dagirkirina Til Rifetê ye`

Her wiha Zêneb destnîşan kir ku faşîzma Tirkiyê bi gefên ku Til Rifet dagir bike siyaseta xwe dide meşandin û wiha domand: “Faşîzma Tirkiyê di pilanên dagirkerina xaka Sûriyê bi giştî û bi taybet ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê de tenê bi dagirkirina Efrên, Serê Kaniyê û Girê Sipî nesekinî. Piştî

zêneb silêman

dagirkirina Herêma Efrînê bi bilangeriyeke mezin dagirkirina bidestxistina Til rifetê her tim di rûjevê de ye. bi vê armancê hovîtiya xwe pêk tîne û li hemberî van êrîşan bêdengiyeke navnetewî û cîhanî heye. Diyar dibe ku dagirkirina tavahî herêman ji aliyê faşîzma Tirkiyê ve weke rewşekî ji rêzê û rewa tê dîtin”.

`Bi armanca têkbirina îradeya gel êriş tên kirin`

Recae anî ziman ku bi domandina van êrîşan îradeya gelê welatparêz nayê şikandin û wiha got: “Tavahî pilanên dagirkeriyê yên li ser herêmê têm

Rece Hisên

meşandin, di asta yekemîn de hebûn û destkeftiyên ku hatine bidestxistin têk bibe û di herêmê de tevlîheviyê bide avakirin. di vê çarçûveyê de çi îradeya gelên herêmê tê hedefgirtin, da ku ji xeta berxwedanî û têkoşînê gav paş de bavêjin. Netêkbirina îrade û vîna bi hezaaran ji gelê Kurd ku bi salane di xeta azadî û demokrasiyê de bedel û ked dane hatiye îsbat kirin. êdî faşîzma Tirkiyê jî vê yekê baş dizane ku ev gel rûxmî topbaran, hedefgirtinan û pêk anîna komkujiyan kêliyekî jî dev ji doza hebûn û nebûnê bernadin. Îradeya gelê welatparêz bi siyaset û topbaranên dijim nayê şikanidin”.

Du gunehkar; Receb û Netanyahu

Ahmet Aktaş

Erê weke ser nivîs dibe ku hinek kurt were nivîsandin, lê kêm e û divê wisa were temam kirin: Du gunehkar û nîv! Ev nîva jî, li welatê me Berzanî, li Fliŝtîn jî dibe HEMAS û hwd.bin. Dema ku weke gotin bi “nîv” hatin navdar kirin, nayê wateya gunehên wan jî nîv e an jî gunehên wan ji rêveberên qirker ên dewletên serwer kêmtir e.Na xêr, heke li ser van têgehan baş lêkolîn werin kirin, dibe ku gunehên hevkarên xwecih, ji yên qirkerên dewletên serwer; ji Receb û Netanyahû girantir bin.

Jiber ku hema li welatê me, bi mînakekê tinê jî ev rastî zelal li ber çava ye.

Receb T.Erdogan, 21 sal in, bi hemû hêzên dewleta xwe yên kujer û talanker, êrîşên herî xedar dajo ser Tevgêr û hemû hêjayên gelê Kurdistanê.

Her cûre çekên kujerî û qirkerî, ji yên herî kevn heta yên herî modern, ji yên konvansiyonel û takekesî heta yên herî modern û yên kîmyewî û tektîknuklerî yên komkuj(mirov û xwezakuj) bikar anî û hîn jî bikar tîne.

Lê van hemû çekên giran û xedar, têra qirkirin û tunekirina gelê Kurdistanê û Tevgera wê nekir. Belê dîsa weke kevneşopiyek xerabkar a dîrokî; naçar man ku deŝt avêtin xiyaneta xwecihî ya welatê me: BERZANÎ!

Receb û palpiştên wî serwerên cîhanî, ji bo serkeftina xwe, bi tenê hêviya wan maye xiyaneta bi pêşengiya Berzanî! Lewma dibe ku gunehkarî, sûc û sizayên van “nîv”an zêdetir bin!Îca va sosret û balkêş ev e ku; her du fermandarên komkujiyên gelên Kurdistanê û Fliŝtînê, hevdu bi qirkeriyê tawanbar/gunehkar dikin! Dîşibi mînakek gotina pêşiyan a ku dibêje; beroşekê ji ya din re gotiye, “binê te reş e”, wê jî lê vegerandiye û gotiye, “weleh binê te ji yê min reştir e”!

Receb, bêyî ku li neynikê li xwe temaşe bike, Îsrail mîna dewletek terorîst nîşan dide û Netanyahu jî dişibîne Hitler!

Ma gelo tê jibîrkirin, di 2005an de, ku Receb Serokwezir bû û çû seredana Serokwezir Ariel Şaron li “Qudsa Paytextê Îsrailê”, ji Receb re got “tu bi xêr hatiye QUDSA Paytextê Îsrailê” û hwd. Receb bêdeng ma?Çawa Ariyel Şaron mîna Qesabê Fliŝtînîyan tê naskirin, her wiha Receb Erdogan jî Qesabê Kurdan e!

Receb dibêje Netanyahû, ji bo xapandina raya gişt “2 wezîr(ên fliŝtînî) dane kêleka xwe” û hwd. Ma qey raya gişt ewqas xeşîm dibîne, ma li kêleka Receb zêdetirî 4 wezîran û çîgirî wî jî Cevdet Yilmazê Çebaxçûriyê “kurd” nabînin?

Nuha li ser şerê li Xeza ya Fliŝtînê, Rêveberiya Dewleta Başûrê Efrîqayê, ji bo qirkeriya li Xezayê, gilî li Netanyahû kiriye li Dadigeha Edaletê Navnetewî ya Laheya Hollandayê! Dadigehê di 11-12.1.2024 de doz vekir.

Lê ev kêm e û hinek jî “bêedaletî” ye. Divê Receb Erdogan jî li gel Binyamin Netanyahû li wê Dîwana Edaleta Laheyê cîh bigre. Jiber ku gunehê/sûcê wî ne yê yê Netanyahû kêmtir e, zêdetir e. Her wiha divê BERZANIyê “nîv” jî li rex wan be, da ku koma gunehkaran temam bibin!

Saleke tijî şer û berxwedanî

Endama hemahengiya Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Cîhan Hisên diyar kir ku tevî sala 2023`an salake giran û bêş bû lê di heman demê de saleke serkeftî û têjî berxwedan bû û got, em hêvî dikin ku di sala 2024`an azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk were.

Ronaz Silêman/Qamişlo

Sala 2023`an bi hemû encamên xwe yên baş û nebaş, ji bo gel saleke bi têkoşîn û berxwedaniyê tijî bû. Ev sal li her çar parçeyên Kurdistanê bi têkoşîn û berxwedaneke mezin derbas bû, tevî hemû êş û fedakariyan, têkoşîna ji bo azadiyê sala xwe bi berxwedaniyê derbas kir. Di heman demê de jî sala 2023`an wek salên bûrî gelê kurd li tevahiya Kurdistanê rastî êrîşên dewleta Tirk a dagirker hat. Li hemberî van êrîşên giran jî, Gerêlayên Azadiyê û hemû dînamîkên wê, bi fedekarî û lehengiyeke mezin li ber xwe dan, lewra êrîşên dewleta Tirk a dagirker bê bandor kirin. Herwiha ne tenê ji bo gelê Kurd, ji bo hemû gelan pêwîstî bi çareseriya alozî û pirsgirêkan heye. Ev pirsgirêk û alozî jî çareseriya wê pirojeya Netewa Demokratîk e.

Di derbarê şeşedanên sala 2023'an de û amadekariyên ji bo sala nû endama Hemahengiya Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Cîhan Hisên ji rojnameya me re axivî.

Cîhan Hisên diyar kir ku tevî sala 2023`an salake giran bû lê di heman demê de jî salake serkeftî bû li ser hemû pêkhateyên ku di hundirê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de jiyan dikirin û wiha got: “Di destpêka sala 2023`an de civak bi xwe rastî gelek êrişan û gefên deweleta Tirk a dagirker hat, vê yekê jî gelê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek êş kişandin, ji ber lê kêlek êrişan dorpêç jî hebû, bi taybet li ser Şehba û taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê. Herwiha li hemberî van êrişan jî bi 100`an cangoriyên ji bo axê şehîd bûn. Armanc jî ji êrişên dewleta Tirk a dagirker, hêrsa wê li hemberî Rêveberiya Xweser û pirojeya Netewa Demokratîk bû. Li ser bingeha pirojeya netewa demokratîk gele serkeftin hatin bidest xistin û jin jî karîbû roleke mezin û girîn di nav van serkeftinên ku hatin bidest xistin bilîze, bi tayber di dawiya sala 2023`an de dema ku Hevpeymana Civakî hat avakirin, di heman demê de dema ku kongrê MSD`ê bi tevlîbûna kesên ji hundir û derveyî Sûriyê hat lidarxistin, vê yekê dîsa hêris li dewleta Tirk a dagirker kir, li ser vê bingehê jî êrişên xwe li ser Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêde kir.”

‘Gel riya berxwedaniyê ji xwe re kiriye armanc’

Cîhan Hisên destnîşan kir ku di sala 2023`an de dewleta Tirk a hovane ziyanek mezin li binesaziya herêma me kir û wiha got: “Di sala 2023`an de dewleta Tirk a hovane ziyanek mezin li binesaziya herêma me kir, di heman demê de jî cihên xizmetguzar kir armanc. Dewleta Tirk xwest binesaziya herêmê bi temamî wêran bike, da ku gel ji Rêveberiya Xweser dûr bixe û herêmê ji gelê wê vala bike, da ku xwen û xeyalên xwe pêk bîne, lê ev yek bi berxwedaniya gel nehişt pêk were. Gelê me berxwedanî ji xwe re kiriye armanc, li ser bingeha şerê gelê şoreşgerî jiyana xwe didin meşandin, lewra tu carî êriş û gefên dewleta Tirk a dagirker berxwedana gel têk nabe. Gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye rêxistinkirin û perwerdekirin, herwiha pirojeya heyî ya netewa demokratîk ji bo aloziya ku di hundir û derveyî Sûriyê de diqewimin riya çareseriyê ye.”

‘Çareseriya aloziyên Sûriyê pirojeya Netewa Demokratîk e’

Cîhan Hisên di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku Hevpeymana Civakî ji bo tevahî civakê pêwîste û wiha got: “Encamên ku di Hevpeyman Civakî de hat derxistin ji bo hemû pêhateyan encamek serkeftî û wekhev bû, ya din jî kongirê MSD`ê encamên serkeftî bi dest bixin, lewra ev yek hişt dewleta Tirk êrişan pêk anîn, lê dîsa em dibêjin pirojeya netewa demokratîk wê bibe çareseriya aloziya gelê sûriyê, ji ber çareseriyên ku ji derveyî pirojeya netewa demokratîk in, herêmê hîn zêdetir ber bi xerabûnê ve dibin. Riya giftigûyê her tim bi dewletan re vekiriye, çareserî jî wê bibe netewa demokratîk. Herwiha ya herî girîng di Hevpeymana civakî de ku her kes bi wekhevî û yekîtî jiyan bike û hewldanên vegera koçberan li cih û warên wan.

Herwiha sala 2023`an tevî rastî ewqas êriş ji aliyê dewleta Tirk a dagirker hat berxwedana gel ranewestiya, berovajî wê gel bêtir berxwedana xwe gur kir.”

‘Hêvî dikin ku sala 2024`an bibe sala azadiya fîzîkî ya Rêber Apo’

Endama hemahengiya Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Cîhan Hisên axaftina xwe wiha qedand: “Ya girîng ku em di sala 2024`an de rêxistina xwe berfireh bikin, herwiha biratiya gelan li ser bingeha netewa demokratîk xurt bibe. Herwiha ya herî bi wate kampaniyê ku çêbûne ji bo çareseriya doza kurdî bi rengekî siyasî û azadiya Rêber Apo bi fîzîkî, kampaniyeke berfireh hat li dar xistin û wê heta armanca xwe ya azadiya Rêber Apo di nav gelan de berdewam be, di heman demê de îro tevahî dewlet piştgiriya doza kurd û azadiya Rêber Apo ya fîzîkî dikin, gaveke dîrokî ji bo jin hat avêtin ew e jî bi şehadeta Jina Emînî silogana ‘Jin Jiyan Azadî’ şoreşa jinê li Rojhilatê Îranê hat li darxistin û li cîhanê deng veda, ev jî bi xwe encamên serkeftinê bûn, lewra em hêvî dikin ku sala nû ya sala 2024’an jî bo gelê me bibe sala serkeftin û azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk were.”

‘Sîstema Rêveberiya Xweser, li dijî sîstemên kapîtalîst e’

Avesta Menaf/Qamişlo

Endamê Komîteya Navenda Partiya Demokiratîk a kurdî ya Sûriyê Remzî Şêxmûs destnîşan kir ku sîstema Rêveberiya Xweser li dijî sîstemên kapîtalîst e, lewra rastî êrîş û siyasetên qirkirinê tê. Hêzên hegemonîk, pilanên qirkirinê li hemberî pirojeya ku hatiye avakirin, dimeşînin. Her wiha hewil didin sîstema ku li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hatiye rûniştandin, tune bikin.

Dewleta Tirk a dagirker, roj bi roj êrîşan bi balafirên bêmirov li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pirtir dike. Di van êrîşan de, gelek kes şehîd bûne. Ji destpêka Cotmeha 2023`an de êrişên dagirkeriyê zêde bûne, bi taybetî di van demên dawî de ku binesaziyên herêmê û navendên sivîl wekî çapxane, nexweşxane ... hwd kir armanc.

Li hemberî van êrîşan, gelê azadîxwaz serî natewîne û ji bona xwe riya berxwedanê hilbijartiye. Di derbarê êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, Endamê Komîteye Navenda Partiya Demokiratîk a kurdî ya Sûriyê Remzî Şêxmûs ji rojnameya me re axivî û got: “Armanca Tirkiyê, dagirkirina tevahî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye û piştî dagirkirina Girê Spî û Serê Kaniyê hîn di wê xewin û xeyalên xwe de ye ku peymana mîsaqa milî pêk bîne.

Her wiha berî demekê jî Cebhet El Nesrayê digotin emê heta Helebê bikin bin destê xwe de, em dizanin ku yê piştgiriya wan dike dewleta Tirk a

dagirker e. Di dema ku êrişî herêmên Bakur û Rojhatê Sûriyê dike, dibêje em şerê terorê dikin. Bi vê behaneyê, şerê xwe yê qirêj rewa dike, em baş dizanin ku dewleta Tirk a dagirker dihêle ku teror derbasî xaka me bibin û herêmên me parçe bikin”.

“Dagirkerî, ji pirojeya Rêveberiya Xweser ditirse”

Remzî wiha berdewamî da axaftina xwe û got: “Armanca dewleta Tirk a dagirker dixweze kurdan qirbike, lê ev yek ne gengaze. Gelê kurd serkêşiya pirojeya herî guncaw ya şereseriyê û aşîtiyê dikin û bi riya vê pirojeyê wê guhertineke mezin di civakê de pêkwere. Her wiha pirojeya Rêveberiya Xweser a biratiya gelan ku di nav xwe de gelek netewên mîna Çerkes, Suryan, Ermen, Ereb, Êzîdî û kurdan dihewîne. Ji ber vê yekê jî dewleta Tirk a dagirker ji pirojeya Rêveberiya Xweser ditirse û naxwaze ku bi ser bikeve.

Dewleta Tirk a Dagirker xwe li ser talankirin û qirkirina gelên herêmê ava kiriye, piştî hevpeymana civakî û civîna MSD'ê, dewleta Tirk a dagirker binesaziya herêmê kir hedef. Ji ber ku nikarîbû bi şerê xwe yê hovane me bişkîne, xwest di milê aborî de zirarê bide me û koçberiyê bi pêş bixe. Daxawaza me ewe ku em sûriyeke demokratîk ava bikin û hemû netewên Bakur û Rojhilatê Suriyê bihewîne. Her wiha di aliyê aborî, siyasî û civakî de bi serbikeve ku em karibin bi welatên derdorê re têkildariyê bikin. Dema sîstema demokratîk derbasî nava civakê bibe, wê pêşketineke bê hempa bi xwe re bîne. Ji ber vê yekê destkeftî û sîstema ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatî avakirin tirseke mezin di dilê dagirkeran de, daye avakirin”.

‘Vîna me ji pilanên dagirkeriyê yên xerab xurtir e’

Şêxmûs diyar kir ku di herêmên Bakur û Rojhilatê Suriyê de hevpeymana civakî û civîna MSD'ê gaveke giring û mezin bû. Her wiha beriya demekê dewleta Tirk li Dêra zorê fitneyek di navbera Kurd û Ereban de çêkirin û dixwestin ku şer di navbera kurd û Ereban de çêbibe û pirojeya Netewa Demokratîk vala derbixe. Lê bi wan re ne meşiya û nikarîbûn pilana xwe serbêxin. Ji ber ku îradeya me ji pilanên wan yên xerab xurtire. Me gavek pir baş û bi serkeftî avêt, em di wê baweriyê de ne ku emê destkeftiyên hîn mezintir bi dest bixin”.

‘Sîstema me li dijî sîstema kapîtalîst şer dike’

Remzî wiha axaftina xwe berdewam kir:”Di seranserî salên aloziya Sûriyeyê de, gelek kesan mîna komên çete weke DAIŞ'ê, Cebhet El Nusra û di serî de dewleta tirk a dagirker dixwestin ku herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji hev bixin û sîstema rêveberiya xweser biçewisînin. Sîstema rêveberiya xweser ji aliyê hemû pêkhateyên ku li herêmê dijîn,hatiye qebûl kirin. Ev sîstem, li dijî sîstemên kapîtalîst tev digere, lewre rastî êrîş û siyasetên qirkirinê tê. Em her dibînin ku hêzên hegemonîk li hemberî pirojeya ku hatiye avakirin, pilanên qirkirinê dimeşînin û hewl didin sîstema ku li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hatiye rûniştandin, tune bikin”.

‘Çareseriya aloziya Sûriyeyê, divê bi gelên herêmê re bê çareserkirin’

Endamê Komîteya Navenda partiya Demokirat a kurdî ya Sûriyê Remzî şêxmûs eşkere kir ku ger aloziya Sûriyeyê bê çareserkirin wê bi gelê Sûriyeyê be û mudaxeleyên ku ji aliyê dewletên derve ve têne kirin tenê ji bo armancên xwe ne û divê hikumeta Şamê wê yekê bizanibe.

Remzî wiha dawî li axaftina xwe anî: “Ger çareseriyek ji bo aloziya Sûriyeyê hebe wê bi gelê Sûriyeyê were çareserkirin, ne bi dewletên derve. Em weke Rêveberiya Xweser her tim deriyên me ji bo nîqaş û diyalogên bi hikumeta Şamê re vekirî ye. Hikumeta Şamê divê di serî de bizanibe ku mudaxeleyên dewletên derve ji bo aloziya Sûriyeyê, ne ji bo çareseriyê ye, lê belê ji bo bercewendî û armancên xwe ne. Tenê wê gelê Sûriyeyê bi diyalogan aloziyên xwe çareser bikin. Ji ber vê yekê divê zext li hikumeta Şamê were kirin ku dev ji siyaseta xwe ya dorpêçê berde.

FENER

Çareserî bi ramanên Rêber Apo re pêkan dibe

Idrîs Henan

Guhertina hiş têgeheke nû a hevdem e ku berhema reftar û çalakiyên mirov yên neaqilane bi teknelojiya Internêta modern re pêkan kirine. Naverok û cinsê xizmeta têye pêşkêşkirin çi dibe bila bibe, dixwaze negetîv an positîv be, di encamê de mirovan ber tenatiyê ve dibin. Lew re jî jê re dibêjin; dunyaya Ferazî ku fikrîna mirovan di qefesa xeyalên beredayî ya cihana sanal de, li dûrî realîteya jiyanê, esîr digire. Em dikarin bi awayekî din jî bibêjin; teknelojiya îro bûye amûreke sereke ya mayîndekirin û domandina deŝhiladtariya zayendperet a hişmendiya zilamperesî, pala xwe daye zor û şîdetê. Ango, bi wê amûra nerim şîdet, kuştin û qirkirinê rewa dikin, tunekirin û kolekirina gelan jî normalîze dikin. Lew re jî bêhelwesbûyîna li beramberî vê amûra nerim a deŝhiladtariyê isbat dike ku veguheriye navendeke êrişên şerê taybet a psîkolojîk. Bi internêtê re jî, çandeke ku bi lez û bez diguhere hatiye afirandin. Em dikarin bibêjin ku teknolojî ji bo teşekirina çanda me ya îroyîn, bûye alîkar. Mînakên wê jî gelek film û berhemên navenda hegemonîk ên weke Termînator û .. hwd hene. Tam berovajî hişmendiya berê ku digot, çand têknolojiyê diafirîne. Bi gotinek din, teknelojiya îro bi deŝtê hegemoniya global ku navenda deŝhiladtariyê û kolekirinê ye, li ser bingeha çînayetî, koletî, bindeŝtî, zayendpereŝtî û lîberalîzmê têye pêşkêşkirin, armanca wê ya sereke jî, xesibkirina çandî û homojenkirina civakê ye. Jin û ciwan jî di navenda hedefgirtina wê de ye.

Bê guman herî zêde jî mirovê îro, bi taybet beşa jin û ciwanan, bi heyînên fena Tiktok, Facebook, Inŝtigram, Wahtsapp, … hwd re kilît kirin e. Ne şaş be jî herî zêde programên ku zêde dîmen û wêneyên mirovan bikar tînin, ku xîtabî ruhê takekas dikin, tên bikaranîn. Ev yek tercîha mirovan a azadiyê binax dike û di tunela reş a ajoyan de dizivirîne. Ango; jiyaneke wisan, di serî de, deŝwerdana azadîya mirovan, xisûs, û şêwazê jiyanê û civakbûyê dike. Lew re jî; bi zorê me tûşî hinek bijardeyên hatine veqetandin dike. Mînak; em çi bixwînin, em çi bixwin, em çi vexwin, çi bikirin, …. Hwd. Yanê zewqê giştî tayîn dike û civakê li gorî hinek pîvanên serdestiya mutleq dî çînatiyeke xapînok de dide pêşkêşkirin. Li ser bingeha vê nerastîya berdayî, bêkokbûnê esas digire û mirovan ji damaran ve hildiqetîne û weke heyberekî cerbandinê ya labratwaran digire deŝt. Jinan tûşî fîhûşê dikin û ciwanan krîmînalîze dikin. Bi vê Aawayî jî dilê civakê yê lêdide ji nav dibin û deŝtser dikin. Ev yek deriyê civakeke jihevketî û ne lirê vedike. Ango; civakeke yekrengî ya pala xwe daye kuştin, qirkirin, şîdet û tunehesibandinê ya homojenkirî dide avakirin.

Çareseriya maqûl û guncaw jî di gotina Rêber APO de ye, Her tişt li ser koka xwe hişîn tê. Yanê pêwîste mirov li dîrok û çanda xwe ya resen vegere û xwedî lê derkeve ku ji asîmîlasyonê biparêze û li cihê wenda kiribe li çareseriyê bigere. Normên civakbûyînê di nav rêxistînbûyîneke qewîm de biparêze û lêgerînên xwe yên azadî û demokrasiyê zêdetir bike. Her wiha, fena Me`yên Înnanayê lazime nirxên mirovahiyê werin zindîkirin û di çarçoveya jiyana xwezayî ya dayîksalarî de, posîtîvên teknelojiya heyî ji bo jiyaneke azad werin çewisandin û bikaranîn. Yanê çareserî bi jiyanîkirina ramanên Rêber Apo re pêkan dibe.